

Haşiyeya Enwar el-Tenzîlê ya Muḥemmed el-Şîranşî el-Kurdî

Mustafa Dehqan*

Wergera ji Ingilîzî: Robîn Şahin

Herçend hizra berbelav ew be ku kurdên misilman di nav civaka misilmanan de xwedanê roleke duhemîn bûne, lê di rastiyê de ew bi medreseyên xwe yên veder û bi pêşengên xwe di gelek meseleyên dînî yên girîng de çalak bûne. Kurd, bi rêya propagandaya li dijî terîqetên derveyî nerîtê (*non-orthodox*), binecihkirina mifredata îslamî li medreseyên kurdî û nivîsandina şîroveyan gotinan li ser metnên dînî tevî meseleyên civaka îslamî dibûn. Haya Şerefxanê Bedlîsî jê hebû ku ev şîroveyan kurdî yên têgehane hêjayî lînêrîneke taybet bûn.¹ Lê dîsa jî ew di *Şerefnameya* xwe de şîroveyan alimên kurd yên li ser mentiq, nehew, fiqh, hedîsê û her wekî din cuda nasenifîne. Bi ihtimaleke mezin, sedema vê yekê ew bû ku şîroveyan têgehane ên bi zimanê erebî ku kurdên misilman nivîsîbûn kêmbûn. Ev amrazê edebî [*haşîye*, şîroveya têgehane] herwiha xwedanê girîngiyeke taybet e lewre bi xêra wan û di rêya destnivîsarên neçapkirî re em dibînin ku kurdên misilman ji bo minasebeta xwe ya bi dîn re gelek çaran berê xwe didane berhemên girîng ên îslamî.

Di berdewamiya vê nivîsarê de ez ê bala xwe bidime ser *haşiyeya*² ku Muḥemmed el-Şîranşî el-Kurdî li ser *Enwar el-Tenzîla* Beydawî nivîsiye. Armanca serreke ya vê nivîsarê ew e ku bala xwendevanan bikêşe ser vê xebata ji sedsala 16an ku di nav kurdan de bi temamî nenas maye.

Destpêk

Ev destpêk nîrxandîneke kurt e li ser girîngiya vekolîna zanistî ya şerha *Qur'anê* ya Beydawî, ku wek *Enwar el-Tenzîl* tê naskirin. Ev şerh ji bo hînîkirina *tef-sîrê* (şîroveya *Qur'anê*) li medreseyên cîhana îslamî wek materyalê perwerdeyê dihate bikaranîn û gelek *haşîye* li ser vê şerhê hatine nivîsîn.³

* Lêkolerê serbixwe, Kerec, Îran,
e-mail: mustafadehqan@yahoo.com

‘Ebdillah b. ‘Umer b. Muḥemmed b. ‘Elî el-Beyḍawî ji mekteba Şafi‘î û ji dînnasiya Eş‘erî bû. Ew li Bexdayê perwerde bû û li Şîrazê gihişte mertebeya qazîtiya payebilind. Tarîxa mirina wî ne zelal e. Herçend bi rengekî berbelav sala 685/1286an wek tarîxa mirina wî tê dîtin, hin lêkoleran salên 691/1292, 692/1293 û heta 716/1316 wek tarîxa mirina wî diyar kirine.⁴

Beyḍawî pirê caran berhemên xwe li dû modêla şerhan radiçand û hêman û parên ji hiqûq, qanûnnasî, tarîx, rêziman, dînnasî û tefsîra *Qur‘anê* di nav çarçoveya vê modêlê de bi cih dikirin. Lê belê, berhema Beyḍawî ya herî meşhûr, *Enwar el-Tenzîl we Esrar el-Te‘wîl* (Roniya wehyê û sîrrên şîrovekirinê), tefsîreke *Qur‘anê* ya berbelav e. Ji bo ku *ḥaşiyyeya Şîranşî* baş were fêmkirin divê em çend gotinan li ser *Enwar el-Tenzîlê* bibêjin ku metnê sereke yê *ḥaşiyyeyê* ye.

Ji xisûsiyetên *Enwar el-Tenzîlê* yên ku ji bo xebatên li ser Qur‘anê xwediyê girîngiyeke taybet in em ê pêşî balê bikêşine ser terzê wê. Beyḍawî qala navên sûret û ayetan, û carinan jî *şe‘n el-nuzûlê* dike. Dîqetêke mezin ji bo gramêr û şêweyên xwendinê tê veqetandin û li ser kêşeyên teolojîk ku misilmanên din gelek caran balê dikêşine ser nayê sekinîn, herwiha nîqaşên teswîrker ên li ser ayetan jî têne kirin.

Wisa xuya ye ku ev tefsîr dikeve nav koma wan tefsîran ku nivîskar tê de bi nîşandana hejmareke mezin a *neqlan* hewl dide tefsîra xwe ji wan tefsîrên li ser bingehê *‘eql* cuda bike. Lê belê, zanîn û aqil û rola wan ya di tefsîrê de li nav gelek beşên *Enwar el-Tenzîlê* wek meseleyeke cihê rêz û hurmetê dimîne.

Li gor berhemên pêşîn ên el-Zemexşerî (mir. 538/1144), *el-Keşşaf*, mirov dikare bibêje ku *Enwar el-Tenzîl* carinan bi aşkerayî di bin tesîra Mu‘tezîliyan de ye.⁵ Tesîrên ku Zemexşarî li Beyḍawî dike sethî ne. Wek lêkolerekî Şafi‘î-Eş‘erî nimûneyên seyr yên nîqaşên polemîk li hember *kelama* Mu‘tezîlî pêşkêş dike.⁶

Xaleke din ku derdikeve hemberî me berfirehiya eleqeya wî ya li ser *fiqhê* ye. Ji bo Beyḍawî, lêkolîna ayetan bi nêrînên *fiqhî* pir girîng bû û belkî pêdiviyeke bingehî jî bû.⁷

Beyḍawî *Keşşafa* el-Zemexşerî û *Tefsîr el-Kebîra* Fexr Razî (mir. 606/1209) ji şîroveyên xwe re we bingeh digirtin. Nivîskar herwiha ji *Cami‘ el-Tefsîr* ya Huseyn b. Muḥemmed jî, ku wek Raxib Îsfehanî tê naskirin, materyal bi ser ve dikir.⁸ Yek ji çavkaniyên wî *îsra‘iliyat* e; lê belê, carinan rexneyên rijd li cureyê agahiyên ku *îsra‘iliyat* dide dike.⁹

Nivîskar

Muḥemmed el-Şîranşî el-Kurdî, bi navê xwe yê tekûz, carekê di *Şerefnameyê* de derbas dibe. Varyantên heyî dihêlin ku navê Şems el-Dîn Mewlana Muḥemmed Şîranşî wek Şems el-Dîn Muḥemmed Şîranşî û Mewlana Nûr el-Dîn Muhammed Biranşî jî bê xwendin.¹⁰ Balkêş e ku li gorî *Şerefnameyê* elaqeya wî pêşî li ser tef-

sîrê ye û pey re li ser astronomî, mentiq û kelmê ye. Ji xeynê wê agahiya ku nîşan dide ew ji dor 999/1590–91ê û pê de *müderrisê* (dersdar) sereke yê Îxlasiyeya li Bedlîsê bû, nayê zanîn ka jiyaneke wî ya çawa hebû. Ne ti agahiyeke din li ser jiyana Şîranşî heye û ne ti nivîsarên wî hatine parastin.

Şerefxan sala 999/1591ê emrê avakirina *medreseya* Îxlasiyeyê ya li Bedlîsê da. Guman nîne ku ji 999/1591 heta 1005/1596–97an, Şîranşî *müderrisê* sereke yê Îxlasiyeyê bû. Wî demeke di navbera 1005/1596–97 û 1010/1601–02an de cihê xwe ji Ebûbekir (*el-müderris bi'l İhlasiyye*) re hişt, ku alimekî din ê Bedlîsê ye. Heye ku Ebûbekir şagirdê Şîranşî bû û yek ji ‘*ulemayê* bû ku nameyek ji siltan re şandin ku tê de daxwaza guhertina qirarên împatoriye yên li ser Bedlîsê dihate kirin.¹¹

Mixabin ti notên biyografîk li ser *haşiyeya* ku em li vir berê xwe didinê nehate danîn. Lê ji ber ku *haşiyeya* wî ya li ser *Enwar el-Tenzîlê* heman salê hatiye nivîsîn em dikarin bibêjin ku Şîranşî heta sala 1024/1615an jî sax bû.

Destnivîsar

Destnivîsara *Haşiyeya* Şîranşî ji aliyê nivîskarê vê meqaleyê ve di nav koleksiyona *tefsîrên* erebî ya Astan Qudsê de li Meşhedê hatiye vedîtin (Jimara qeydê: 38782). Qewareyê wê teqrîben 21x14/5 cm e. *Haşiyeya* Şîranşî di perên 93b–238b de cih digire, li gel berpereke vala li dawiyê. Di berperê pêşîn ê *haşiyeyê* de (92b) de bi tirkî agahînameyê kurt li ser mijara kehanetê heye. Bi rênimayên kurt tê saloxdan ka mirov çawa bi rêya bikaranîna hejmareke elifbêyên sihr û kehanetê dikare pêşbînîyan li ser paşeroja mirovan bide.¹² Nivîskarê ku navê wî nediyar e berperê pêşîn wek *tilism* (telesim) pêşkêş dike. Nota bi erebî jî, ku li aliyê rastê yê berperê ye, dîsa bi heman destî hatiye nivîsîn.

Di beşê destpêkê yê destnivîsarê de, li ser berper 93a, du referensên bi erebî li ser tiryakên nebatî û diayên îslamî hene. Li vir tiştê bi taybetî girîng ew e ku navê Muḥammed el-Şîranşî el-Kurdî wek nivîskarê *haşiyeya* li ser *Enwar el-Tenzîlê* derbas dibe, ku ji sûreta el-Neba’ (78) heta bi dawiya sûreta el-Ma’ûn (107) e. Ev ji aliyê katibekî diyar ve hatiye înzekirin, ku navê wî Şefa’î el-Xunsarî ye û heye ku ji Xansara li Îsfahanê be. Li ser destnivîsarê herwiha hin mohrên xwediyên kitêbê hene ku qismen we “Muştafa” û “Huseyn” têne xwendin. Ev mohr yê xwediyên kitêbê yê heyamên paştir in (berperên 117a, 238b, û 244a).

Piştî *bismilaha* destpêkê şîrove bi têbînîyên Şîranşî (bi nîşana Muḥammed) û yê nivîskarekî bi navê Mûḥî el-Dîn dest pê dike (bo nimûne berper 129b). Her du nivîskar girîngiya şîrovekirina ayetên *Qur’anê* diyar dikin û îdia dikin ku şerhên *Qur’anê* di ser temamê zanistan re ne. Carinan zehmet e mirov piştrast be ka kîjan *haşiyeyê* ji aliyê Şîranşî ve û kîjan ji aliyê Mûḥî el-Dîn ve hatiye nivîsîn. Metn, tevî şîrove û hin sernivîsan, bi xeta nesxê hatiye nivîsîn. *Haşiyeya* Şîranşî

ji sala 1024/1615an e. Bi giştî li ser kenaran û qismen di metnê bi xwe de gelek haşiyê hene û hin ji wan ji haşiyeyên kurt û hin ji yên dirêj pêk tên. Şîranşî, Mûhî el-Dîn û *muhaşşiyên* bi bingeh û terbiyeya îslamî (‘Îsam el-Dîn¹³, berper 107a; Şeyxzade¹⁴, berper 219a; û Xelxalî¹⁵, berper 219b) bi hev re di pêkanîna haşiyeyên *Enwar el-Tenzîlê* de pişkdar in. Lê belê, sercemê naveroka *haşiyeyê* xwe-diyê karakterekî homojen e lewre nezerên serdestên *Enwar el-Tenzîlê* dinimîne û li ser pirsên rêzimanî yên metnê disekine.

Bi giştî ne zelal e ka *Haşiyeya* Şîranşî berî yan piştî 1024/1615an hatiye nivîsîn. Heye ku haşiyeyên piştî sala 1024/1615an ji aliyê Şeyxzade, Xelxalî û bi taybetî jî ji aliyê Mûhî el-Dîn ve hatibine nivîsîn. Ji ber ku tarîxa pêşî ku katib di destnivîsarê de dide 1052/1642–43 ye, divê haşiyeyên Mûhî el-Dîn piştî mirina Şîranşî hatibine nivîsîn. Mirov dikare bi rehetî hin haşiyeyên Mûhî el-Dîn ku tê de amajeyên li ser heman mijarê hene û bi heman şewazî hatine nivîsîn (berper 129b, 202a) ji tarîxên 1114/1702–03an bihesibîne. Tarîxeke din jî heye ku nîşan dide ku katibekî nediyar nusxeyeke destnivîsarê sala 1100/1689an li Stenbolê nivîsiye (berper 241b). Hevgirtina di navbera vî beşê dawiyê û *Enwar el-Tenzîlê* de gelek zêf e.

Ihtimal kême ku destnivîsar ji aliyê bi tenê yek katibî ve hatibe nivîsîn. Ya bêtir nêzîkî rastiyê ew e destnivîsar ji aliyê temamê xwediyar ve hatiye çêkirin, lê belê haşiyeyên sereke yên destnivîsarê ji Şîranşî bi xwe ne. Metn bi xwe ji aliyê çendek destên nediyar ve hatiye nivîsîn û gelek têbînî pey re bi ser ve hatine zêdekirin. Delfîl îşaret dikin ku beşê sereke yê destnivîsarê ji aliyê kurdan ve hatiye pêkanîn. Eger rast be, ev yek jî dê bibe palpişt ji bo ihtimala duristbûna kitêbê li Kurdistanê, lê ihtimal her heye ku hindêk ji berperan li Stenbol an li Tewrêzê hatibine amadekirin. Ji berper 239a diyar dibe ku destnivîsar li Cezîret el-‘Ûmeriyeyê, li Kurdistanê, hatiye nivîsîn. Mumkin e ku wek kurd têkiliyê Şîranşî bi Cizîrê re hebû.

Hin parçeyên bi erebî li dawiya *Enwar el-Tenzîlê* hatine zêdekirin (berper 239a–244b). Haşiyeyên bi zimanên din kême caran bi farsî ne (berper 124a, 171a, 212a, 243a). Bi giştî haşiyeyên bi farsî di helbestan de hatine bikaranîn.

Şîranşî, ku ji nav nivîskarên li ser *Enwar el-Tenzîlê* haşiyê nivîsîyî yê herî kevn û zana, gelek caran behsên rêzimanî jî pêşkêş dike. Nîqaşên ku nêrînên wî nîşan didin bingehê xwe tim li ser şîrovekirina ayetên *Qur’anê* dideynin. Hin ji haşiyeyan detayên biçûk ên *Qur’anê*, bawerî û tetbîqa dîne îslamê pêşkêş dikin, ku Şîranşî bi rêya wan û bi teşebiseke têrtinaz nakokiyên wan ên navxweyî dide xuyakirin. Hewayeke mixalif di raveyên wî de heye ku rexneyên Beydawî bi xwe tîne bîra mirov. Carinan zimanê haşiyeyan zêde ne qewî ye. Carinan şaşiyên seyr ên rêzimanî hene ku têgihîştina mebesta ji metnê pir zehmet dixin. Ji ber ku tenê destnivîsareke xebatê berdest e û agahiyên em dizanin ji vê destnivîsarê tên

divê em di şîrovekirina *haşiyeya Şîranşî* de hesas û bidîqet bin.

Mixabin ti xebatên Şîranşî yên ji dema dersdariya wî ya medreseya Îxlasiyeyê negihîştine roja me. Girîngiya ew dide *Enwar el-Tenzîlê* hêjayî venihêrîneke taybet û lêkolîneke nêzîktir e, lê bo niha hêviya me ew e ku xwendevan vê nivîsara pêşkêşkirina berhemê bi destpêkeke baş bizanin.

Paşnot

1 Bnr. Scheref 1860, i, 341–42.

2 Têgeha *haşiyeyê*, ji erebî *hāşīya*, beramberî “têbînî” û “jênot” e. Lê belê, bi rengekî deqîqtir, ji têbînîyên li derkenarên destnivîsaran û ew nivîsar û kitêbên ku ji bo ravekirina berhemekê tene nivîsîn tê bikaranîn. [*t.e.*]

3 Ji bo lîsteya dirêj a haşiyeyên li ser *Enwar el-Tenzîlê* bnr. Baghdādî 2001, i, 138–43; Tîhrānî 1946, vi, 41–45.

4 Bb. Subkî 1992, viii, 157; Hûsaynî Fasā’î 2003, ii, 1272.

5 Bn. 2: 3.

6 Bn. 2: 49.

7 Bn. 9: 64.

8 Ev nivîskarê *Tefsîr el-Raxibê* ye. Bnr. Hājjî Khalîfa 1941, i, 447.

9 Bn. 12: 24.

10 Li Bodleian Elliott 331, fol.147v.; Bodleian Elliott 332, 118v.; Bodleian Huntington Donation 13, fol.128v.; Cambridge Browne H. 10, fol.83v. binêre. Ji bo xwendinên varyantê ez spasiya Saçha Alsancakli dikim. Herwiha bide berhev Kâtîb Çelebi 1824, 414; Baiazidî 1986, 194.

11 Bnr. Başbakanlık Osmanlı Arşivi A.DVN, 3/95.

12 Metna bi tirkî wiha tê xwendin: *Her niyete bir fatiha okuduktan sonra bir harfe barmak basub ol harfi saymayub ögündeki harfi sayub her harfi ki on olursa onu yazub tamam bu üslub üzere yazub devri tamam ettiikte Fars lafızıyla okuyub muradın bud va nabudu ola. Huruflar bunlardır ki zikr olundu, û hwd.*

13 Amaje bi ihtimaleke mezin li ‘Işām al-Dîn Ibrāhîm b. Muḥammad b. ‘Arabshāh Isfarā’înî (mir. 943/1536–37) ye, ku nivîskarê *haşiyeya xerabbûyî* ya li ser *Enwar el-Tenzîlê* ye. Bnr. Ahmad 2010. Ew herwiha weke ‘Işām al-Dîn Chalabî jî tê naskirin.

14 Ev Mûhî al-Dîn Muḥammad b. Muştafâ Qujawî ye (mir. 951/1544–45), ku zêdetir weke Shaykhzâda tê naskirin. Bnr. Hājjî Khalîfa 1941, i, 188.

15 Ev ne zelal e û dikare bi du awayên diyar were şîrovekirin, ku her du jî ji aliyê tarîxî ve rast in. Eger ji vê qesd lêkolerekî şî’î be, hingê ew an Sayyid Hûsayn Khalkhālî (mir. 1024/1615) an jî ‘Alî Qulî b. Muḥammad Khalkhālî (mir. 1115/1703–04) ye. Lê eger wek lêkolerekî sunnî were şîrovekirin, hingê îşaret bi Naşr Allāh b. Muḥammad ‘Ajamî Khalkhālî Şafî’î (mir. 1101/1689–90) dike. Bnr. al-Zaraklî 1980, viii, 31.

Bibliyografi

Eḫmedî, M. Beydawî we Tefsîr-i Enwar el-Tenzîl (Tehran: Xane-yi Kitab, 2010).

Bexdadî, Isma‘îl Başa. Îdāḥ el-Meknûn, ed. M. Ş. Yaltqaya û R. B. el-Kilîsî (Beyrût: Dar İhya’ Turath el-‘Erebî, 2001).

Bayezîdî, M. M. Tevarîxî Qedîmî Kurdistan («Drevniaia Istoriia Kurdistana»), Pervod «Sharaf-Nāme» Sharaf-khāna Bidlysy s Persidskogo Yazika na Kurdskiî Yazik (Kurmandži), ed. K. K. Kurdoev û J. S. Musaelian (Moskow: Nauka, 1986).

Hûseynî Fasā’î, Hājj Mîrza Heşen. *Fars-name-yi Naşîrî*, ed. M. Restgar Fesa’î (Tehran: Emîr Kebrî, 2003).

Kâtîb Çelebi [Muştafâ b. ‘Abd Allāh Hacı Halife]. *Cihannümâ* (Konstantinople: el-Amire, 1824).

Kâtîb Çelebi [Muştafâ b. ‘Abd Allāh Hacı Halife]. *Keşf el-Zînun an Asamî al-Kutub wa al-Funûn* (Istanbul: Maarif Matbaası, 1941–43).

Scheref, Prince de Bidlis. *Scheref-Nameh ou histoire des kourdes*, ed. V. Véliaminof-Zernof (St.-Petersbourg: Commissionnaires de l’Acadé-

mie Impériale des Sciences, 1860–62).

Subkī, Taj el-Dīn b. ‘Elī. *Tebeqat el-Şafi‘iyye el-Kubra*, ed. M. M. el-Ṭenaḥī & ‘A. M. el-Ḥalu (Beyrūt: Dar el-Neşr, 1992).

Ṭihranī, Aqa Buzurg. *el-Deṛi‘e* (Tehran: Bank Millī, 1946).

Zaraklī, Khayr al-Dīn. *el-E‘lam* (Beyrūt: Dar el-‘Ilm lil-Mulla‘in, 1980).